Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1276 | 25-Gulan-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Mîhrîcana Nûjiyan; Avakirina qadeke azad ji jinên sînameger e

**Aryen Hesen/Qamişlo**

**Rêveberiya Kezî û Kolektîva Jinên Sînameger Sefînaz Evdikê diyar kir ku wê Mîhrîcana Nûjiyan di navbera 25-31'ê Gulanê li bajarê Qamişlo bê li darxistin û ji her çar perçeyên Kurdistanê wê jin beşdar bibin, herwiha wê di mîhrîcanê de fîlmên jinan yên ji gelek welatan bên nîşandan.**

Mîhrîcana Fîlma Jin a Nûjiyan care yekemîne ku wê bê lidarxistin, di mîhrîcana ku wê di 25'ê Gulanê de li bajarê Qamişlo bê lidarxistin, ji çar perçeyên Kurdistanê û cîhanê fîlmên jinan wê bên nîşandan, herwiha wê ji her çar perçeyên Kurdistanê jin beşdar bibin.

Mîhrîcana fîlma jin a Nûjiyan ji aliyê Kezî û Kolektîfa Jinên Sînameger ve di navbera 25-31' ê Gulanê de wê bê lidarxistin, Herwiha Sînema Jin a Rojava, Hîlala Zêrîn û Kevana Zêrîn jî piştevaniya mîhrîcanê dikin. Di mîhrîcanê de wê semîner û panel werin lidarxistin herwiha wê fîlim û kurte fîlim bên pêşandan.



Derbarê amadekiriyên Mîhrîcana Jin a Nûjiyan, derhêner û Rêveberiya kezî û kolektîva jinên sînameger Sefînaz Evdikê ji rojnameya me re axivî.

**'Mîhrîcana fîlima Nûjiyan care yekemîne ku tê lidarxistin'**

Sefînaz Evdikê destnîşan kir ku mîhrîcana filmê Nûjiyan di navbera 25-31' ê gulanê li bajarê Qamişlo tê lidarxistin û wiha got: " Mîhrîcana fîlima Nûjiyan care yekemîne ku tê lidarxistin ,fîlim li navenda Mihemed Şêxo û parka Azadî wê bê lidarxistin. Filmê ku beşdarî mîhrîcanê bûne navneteweyî ne ji gelek welatan hatine hilbijartin, belge fîlim, kurte fîlim, fêlimên dirêj hene, derhênerên wan hemû jinin û hemû fîlim wê wergera wan ya kurdî were kirin. Mîhrîcana fîlima jin a Nûjiyan ji aliyê kolektîfa kaziya jinên sînameger ve û hevkariya desteya çandê a Kantona Cizîrê, Sînema jin a Rojava û Hîlala Zêrîn tê lidarxistin."

**'Armanca me ku qadeke azad ji jinên sînameger re ava bikin'**

Sevînaz Evdikê diyar kir ku armanca wan avakirina qadeke azad ji jinên sînameger re û wiha domand: "Armanca me ji vê mîhrîcanê ku bingeha temaşekirina fîlm û çîroka jin bê avakirin. Ev fîlmên ku beşdarî mîhrîcanê bûne, çîrok û derhîneriya jinan e, jinan bi hev re çîrok û rastiya xwe didin xuyakirin. Çîrokên jinan, zehmetî, zor, berxwedan, cesaret, têkoşîn û serkeftina wan me kirine çîrok û me xwest ku li tevahî cîhanê belav bikin."

**'Jin ji çar parçeyên Kurdistanê û Ewropayê beşdar dibin'**

Sevînaz Evdikê di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Mêvanên ku tevlî mîhrîcanê bibin bi xwe derhînerên fîliman e, wê ji Ewropayê, Başûrê Kurdistanê, Rojhilatê Kurdistan, Libnan û wê ji hundirê Sûriyê jî bên. Kordînetorên mîhrîcana jin a jinên sînameger a Leşbona ew jî tevlî dibin."







## Çandina dil

**Cîger Efrîn**

**Çandina dil di dil de zor e**
**Axa dilêm ne reş, ew sor e**
**Xelk diçînin dar û zarokan**
**Derdêm dîtina dilên sor e**

**Gerok im, gerokê kesên b' ruh**
**Her dibînim mirovên bêruh**
**Pişkivîna gula dil ruh e**
**Dilêm ranake kesên bêruh**

**Tenê hatiye gotin û bes**
**"xaliq j' rûyê xwe xuliqand kes"**
**Yeqîn nakim bi wê gotinê**
**Ger raste, Wî b' Wan nasdikin bes**

**Derdêm ne kengê kes xuliqî**
**Gupika jiyana Wî/Wê peqî**
**Kengê dehifî ber qiraxê**
**"Jiya" bê evîn û xeniqî**

**Û heta kengê jîna bêeşq**
**Jiyana mîna dareke req**
**Ha mirin û ha jîna bêruh**
**J' azadî tê tehma eşqaheq**

**Cîger şewitand dil û cîger**
**Bo evîna xwe da qam û beser**
**Bû derdkêş û hozanê eşqê**
**Got; bêeşq reşe jîna beşer**



Sudoku: Bersiv 41

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 3 | 2 | 9 | 5 | 4 | 7 | 6 | 8 |
| 6 | 9 | 5 | 2 | 8 | 7 | 3 | 1 | 4 |
| 7 | 8 | 4 | 6 | 3 | 1 | 9 | 5 | 2 |
| 4 | 5 | 9 | 7 | 2 | 8 | 6 | 3 | 1 |
| 3 | 1 | 8 | 4 | 6 | 5 | 2 | 9 | 7 |
| 2 | 7 | 6 | 3 | 1 | 9 | 8 | 4 | 5 |
| 8 | 4 | 7 | 5 | 9 | 3 | 1 | 2 | 6 |
| 9 | 6 | 1 | 8 | 4 | 2 | 5 | 7 | 3 |
| 5 | 2 | 3 | 1 | 7 | 6 | 4 | 8 | 9 |

Sudoku:Pirs 42

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | 8 | 7 | | | 5 | |
| | | 6 | | | 1 | 4 | | |
| | | | 2 | 3 | | 8 | | |
| 6 | | 1 | | 4 | | | | 7 |
| 2 | | | 3 | | 9 | | | 5 |
| 8 | | | | 2 | | 3 | | 4 |
| | | 7 | | 8 | 2 | | | |
| | | 2 | 7 | | | 6 | | |
| | 5 | | | 9 | 3 | | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER NEJÎRBÛNÊ**

**Pê re derneket serî:**
- Pê nikarî; nikare weke wî bike; weke wî nabe.

**Serî pê re dernayne:**
- Pê nikare; weke wî ne jîr e; weke wî nikare biaxive.

**Serî pê re dernexist:**
- Bi heman wateyê.

**LI SER XWEINKARKIRINÊ**

**Berû bi qalikê xwe dikene:**
- Dema yek xwe ji xwe mezintir nîşan dide, henekên xwe bi malbata xwe, derdora xwe dike, qîma xwe bi derdora xwe nayne, jê re tê gotin.

**Berûya ji qalpûçika xwe der e:**
- Bi heman wateyê.

**Berû ji kêlika xwe dikeve dibêje devê wê çende ye:**
- Bi heman wateyê.

**Berû ji darê ket got devê kovikê çi fireh e:**
- Bi heman wateyê.

**Berû ji qalik dikeve dibêje devê wê çende ye:**
- Bi heman wateyê.

**Weke kîsoyê ji qalikê xwe neqayîl e:**
- Qure ye; xwe pir mezin dizane.

**LI SER BEHANEYAN**

**Berpîk danê:**
- Ji bo nekirinê behane nîşan dan; li paş xist.

**Bûkê nizaniya bireqise, digot erd xwar e:**
- Dema yek ji tiştekî fêm nake, yan naxwaze bike lê li behaneyan digere hingê tê gotin.

**Bûkê nizaniya bireqise, digot cî teng e:**
- Bi heman wateyê.

**Diz li mala xwe sond dixwe:**
- Yê nexşeyekê, pîlanekê çêke wê bizane dawiya wê jî bîne; yê karekî bike yan gotinekê bêje wê bizane behaneya wê jî peyda bike.

**Ji kewê re gotin; çima lingên te sor in, got ji serma; gotin me tu di germê de jî dîtî dîsa sor bûn:**
- Tu ne rast dibêjî; tu li behaneyan digerî lê ez ji behaneyên te bawer nakim.

Ji tirsa kûçikan newêre here gund dibêje şev reş e:
- Ji bo nekirinê behane nîşan dan; li paş xist.

Lêva devê kul e nikare bide avê:
- Tu li behaneyan digerî; tu naxwazî bikî.

Ling dan berê:
- Ji bo nekirinê behane nîşan dan; li paş xist.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Desthilata Şamê bi hişmendiya DAIŞ'ê komkujiyan li dijî gelên Sûriyê pêk tîne'



Berpirsa Komîteya Têkiliyan a Kongra Star Emîne Osê eşkere kir ku piştî ketina Rêjîma Baas bi hevkariya hêzên navdewletî desthilata Şamê hat ser desthilatdariyê. Herwiha ji dema hatina li ser desthilatdariyê, Sûriyê di nava aloziyan de jiyan dike û bi hişmendiya DAIŞ'ê komkujiyan li dijî jinan û tevahiya gelên Sûriyê pêk tîne.**R-4**

## Jineolojî cewhera civaknasiyê ye

Dema ku mirov dîroka jinên Kurd digre dest û çavdêrî dike, wê demê mirov hîn zelaltir rastiyên heyî dibîne. Û weke em hemû jî dizanin ku Rêber Apo, ji jinên şoreşger ên wê demê re perspektîfeke wiha da û got; "Dîroka jinê ne hatiye nivisîn û li benda nivîsê ye"...**R-2**





## Zanîngeha Rojava; Beşa Endezyariya Mîkatronîk û Peywendiyan



Zanîngeha Rojava ku di 20'ê Mijdara 2016'an de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye avakirin gelek beşan di nava xwe de dihewîne; yek ji wan jî Beşa Mîkatronîk e ku ji sala 2019'an ve hatiye vekirin û di aliyê avakirina kadroyên Endezyariya Mîkatronîk yên profesyonal de gavên girîng avêtine.**R-6**

## Dengê çiyayî û resen; Tehsîn Taha




Hunermendê nemir Tehsîn Taha, di nav hunermendên Kurd de bi afirîner û keda ku dayî xwedî cihekî taybet e. Ev hunermendê ku tevahiya jiyana xwe ji bo muzîka Kurdî bê navber derbas kiriye, îro jî bi deng û berhemên xwe ji pêşeroja muzîka Kurdî re dibe çavkanî.**R-7**



**Dema Xwepêşxistinê**
Hafiz Ahmet Turhalli R-6



**Entustrîkirina Çandê**
Remezan Olçen R-7

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1276 | 25-Gulan-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# LI HEMBERÎ QEDEXEYAN; TÊKOŞÎN

Bi dehê salan e ku rojnamevanên Kurd li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê tevî hemû êriş, zext, işkence û kuştinê, doza gelekî ku mîras, çand û zimanê wî hatiye binpêkirin, dewam dikin. Ruxmî astengî û qedexeyan, rojnamegeriya Kurdî li ser bingeha felsefeya jiyana azad bû stûna têkoşîna ji bo hebûn, azadî û edaletê. Di roja îro de, bi rihê berxwedana Mezlûm Dogan û Gurbetllî Ersoz, xeta rojnamegeriya Kurdî li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê li dijî siyaseta qirkirin û inkarê, ji bo serxistina pêvajoya "Aştî û Civaka Demokratîk" xebatên giranbuha dide meşandin.**R-3**




## Dîroka civaka Durzî; bawerî û avabûn



Durzî baweriyeke ku bi yekgirtina xwe ya navxweyî tê naskirin û bi yekbûna mutleq a Xwedê bawer in, herwiha li Sûriyê dîroka wan vedigere sedê salan. Peyva "Durzî" ji koka peyva "derz" hatiye. Di dîroka Sûriyê de rola wan a girîng heye, li kêlek wê jî ew rastî gelek zordestî, komkujî û êrişên olperstiyê hatine.**R-5**

# Jineolojî cewhera civaknasiyê ye

Asya Weşûkanî




Dema ku mirov dîroka jinên Kurd digire dest û çavdêrî dike, wê demê mirov hîn zelaltir rastiyên heyî dibîne. Û weke ku em hemû jî di zanin ku Rêber Apo, ji jinên şoreşger ên wê demê re prspektîfeke wiha da û got ku; dîroka jinê ne hatiye nivisîn û li benda nivîsê ye. Û dema ku niha jî pirseke wiha têye kirin û dibêjin, gelo jinên Kurd tişta ku Rêber Apo ji wan kir perspektîf pêkanîn? Ji ber ku mereq dikin û hewil didin ku wê dîrokê, fambikin û ew jî rastiya ku bi destê jinan were nivîsandin wê çawa be; ji ber ku her mêran dîrok di nirxand û dinivisandin û vê carê jî, her kes mereq dike û gerek mereq jî bikin ji ber ku wê jin dîroka xwe binivisînin. Û ne tenê wê jin dîroka xwe binivisînin wê dîroka mirovahiyê, jî pêre xêz bikin ji ber ku jin û civak ji hevdû nayê veqetîn û wê nivîsîneke, gelekî balkêş û bi rewneq be. Û her çiqasî jinan weke takekes ên ku di wan, serdemên partiyêde dîrok nivisandibin jî lê kêm, hestiyar û perçe bûyî hatiye dîtin.

Li ser van bingehan careke din lêkolîn hatiye kirin û li ser bingeha, perspektîfên Rêberê giştî ê gelê Kurd careke din dîroka jin; diber çavan re hatiye derbas kirin û ji nûvde hatiye dest girtin. Cardin Rêber Apo bi fikir û ramanên xwe yên kûr û dewlemend zanisteke, pir nû xiste rojeva jin û civakê de û got ku; dîroka heyî bi destê mêr hatiye nivisîn û mêrê serwer û desthilatdar, bi hişmendiyaxwe ya paşverû her tişt berevajî kiriye û ji ber vê gereke zanisteke jinê hebe. Û dest bi binyad kirina zanista jinê kir û diyarî jinan kir, ji xwe pir şiroveyên Rêber Apo ên li ser zanista jinê; heye û gelekî jî bawerî dide vê zanistê ku wê têrker be ji bo, jin û civakê û wê bi erka xwe ya kolektîf rabe. Û cardin jî Rêber Apo got ku ez bawerim bi wijdanê, jinê û tekoşîna wê û jinan jî her çiqasî pir baş zanista xwe; fam ne kiribin jî lê gelekî kêfxweş û bi kelecan pêşwazî dikin û dikevin, nava hewilana famkirin û pêkanînê de.

Rêveberiya Partiya Azadiya Jinên Kurdistanê, dikeve nava tevgerê de û hewil didin ku wê çawa ji Rêber Apo re; bibin bersiv û bingeha zanista xwe sazûman bikin. Û her çiqasî hewildanên wan bi sancî be jî desteyeke xwe ya lêkolînê, bi rêk û pêk dikin û ji wê desteyê jî fermandar û çelenga Kurd; Leyla Wan jî yek ji endama wê desteya lêkolînê bûye û hêjaye ku, em qehreman û lehenga xwe Leyla Agirî jî bibîr bînin. Rêheval û fermandara gerîla Leyla Agirî jineke pir jîr û jêhatî bû, şehîd Leyla Agirî jineke pir ji xwe razî û serbilind bû. Ez hevala Leyla ji sala 1998 an de nas dikim û ez weke şervan jî, pêre mame û hurmet û qedrê wê jî pir bû li ber dilê min; ji ber ku fermandareke xwedî hişmendiyek Apoger bû. Û şehadeta wê jî gelekî ez xembar kirim û weke partî û sazî jî, wendahiyeke pir giran bû. Nexasim ku ev şehadet di encama xiyaneta Kurdî a reş de, hate çêkirin û ez careke din jî dibêjim: Em ê qet pêxîra wan xayînên rûreş bernedin û em ê tola, fermandar û şehîda xwe rakin û dawî li xiyanetê bînin. Û saziya jineolojî bi pêşengtiya qehreman û şêre jina Kurd, Leyla Agirî wiha pêşket û berbelavî tevahî Kurdistanê û welatê; Rojhilata Navîn û Cîhanê bû. Ji xwe semînera yekem a jineolojî ji hêla fermandar û gelawêj, Leyla Agirî ve hatiye dayîn û paşî milîtan û çalakvanên Kurd ên jin; li zindanên dewleta Tirk hate lêkolîn kirin û pirtûkek hate nivisandin û bi demê re, sazî hate berfireh kirin û weke ku me bilêv kir li her cih û deverê sazî hatin çêkirin. Û tevî zor û zextên dewleta Tirk jî cardin tekoşîneke pir xurt, a jinan hate birêve birin û encamê pir baş jî girt; ji ber ku pêşwazî kirina jinên Kurd, Rojhilata Navîn û Cîhanê jî bi gelemperî jêre bi kelecan, hate pêşwazî kirin û ev jî hişte ku kelecana kar jî di kadroyên saziyê de were çêkirin. Îro jî em dibînin bêka zanista me gihaştiye kîjan, pileya pêşketinê û çawa têye pêşwazî kirin. Ji xwe her tiştek dema ku dikeve rojevê de zor û zehmetiyan, dibîne û piştî ku xwe dide naskirin û xwedî rol dibe wê, demê xwe di fikir û ramanên her kesî de bicih dike. Û nexasim ku zanisteke wiha herikbar û jiyanî be, ji xwe zainsta me jieolojî bala hemû beşên civakê jî; kişandiye û gihaştiye pileyeke bilind. Û weke ku me li jor jî da diyar kirin Rêber Apo ev zanist, danî holê ji ber wê jî bala her kesî kişand û mereq kirin û keda hevalan jî; gelekî bandora xwe kir û bi demê re şehîdên xwe jî, çêbûn şehadetên weke şehadeta rêheval û rêveber Zîlan(Nagîhan Akarsel) û Malda Hesekê jî hate çêkirin. Van hevalan canê xwe kirin fedayî zanista pêşerojê, ya jin û civakê. Û ez dibêjim ku her çiqasî wendahiyên me giran bin jî, wê tekoşîna me berdewam bike û ger ku hewildanên jineolojî hene ku; derkeve lutkeyê de tekez wê bi gelek zehmetîyan re rû bi rû were û ev jî xwezayîye, ji ber ku ti tişteke bi rihetî çênabe û tekez berdêlên wê hebin. Û em weke jin ji Rêber Apo û jinên pêşeng û qehreman, fêre bûne ku her tişt bi berdêle û gerek em ji her tiştî re jî; hazir bin û tekoşîn bikin.

Weke ku em di şopînin zanista me ya jineolojî, gelekî pêşketiye û gihaştiye pileyeke pir bilind û ev jî; me kêfxweş û serbilind dike û di heman demê de, weke jin wefadariya me bi Rêber Apo re dide nîşandan. Û dema ku malbata Rêber Apo ji bo hevdîtina 31 heyva adarê, çûne ziyareta wî Rêber Apo li wir pirsa kovara jineolojî dike û hewildide ku zanibe bêka; tekoşîna wî berhem dide û diyare ku Rêber Apo hêviya xwe ji, tevgera jin û zanista wê jineolojî pir mezine. Û weke ku têye zanîn Rêber Apo mirovê kedê ye û ji hêla parastina keda xwe ve, gelekî baldar û hesase. Em jî weke jin her em li ku dibin bibin gerek em li keda, Rêber Apo xwedî derkevin û dihêla xwe de tekoşîn bikin û pêşbixin û nexasim ku; Rêber Apo ji me ewqasî bawere û em jî heyanî hinasa xwe ya dawiyê bi Rêberekî wiha, azad re girêdayîne ûfedayîne ji bo wî. Û ez jî weke jineke Kurd û tekoşer bang li tevahî jinên Kurd, Ereb, Tirk, Fars û Azerî dikim û dibêjim; em jinên Rojhilata Navîn pêşengin. Û gerek em li wê erka xwe ya pêşengiyê ya ku Rêber Apo daye me, ji dil û can xwedî derkevin û ji xwe bawerbin û gerek; em tekoşîna xwe gerdûnî bikin û her serkrftîbin. Û gerek em zanibin ku zanista jinê zanista meye û ji me têye, xwestin ku em zanista xwe fambikin û bikin zansta sereke û cewhera zanista civak nasiyê. Ez careke din bangewazî tevahî jin û ciwanan dikim û dibêjim em niha, ji her demê zêdetir xwedî destkeftîne û gerek emli wan destkeftiyan xwedî derkevin û bi serkeftinê tacîdar bikin. Bijî Rêber APO. Bijî yekitîya jin û gelan. Bijî zanista Jineolojî. Jin jiyan azadî.

# ‘Kargeha Lîlît çanda Kurdan nîşan dide’

Hêvî Keleş/ Qamişlo

**Rêvebira Kargeha Lîlît Arya Xelîl diyar kir ku; li kargeha Lîlît cil û bergên floklor ên ku çanda Kurdan vedibêjin, tên dirûtin. Arya tekez kir ku armanca wan piştgiriya jinê ye.**



Piştî Şoreşa Rojava, li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, jinan ji bo pêşxistina aboriyê pir xebat kirin û aboriya civakê pêş xistin. Jinan piştî şoreşê mîna tovê jiyanê her tişt li derdora xwe ji nû ve şîn kirin. Bi keda jinê û berhemên wê yên serkeftî, gelek sazî û kargehên jinan hatin vekirin û projeyên pêşxistina aboriyê hatin pêkanîn. Bi Şoreşa Rojava re gelek jinan di nav kar û xebatan de cihê xwe girtin.

Derbarê kar û xebatên ku kargeha Lîlît dide meşandin Rêvebira Kargehê Arya Xelîl ji Rojnameya me re axivî.

**‘Kargeha Lîlît sala 2017’an dest bi kar kir’**

Rêvebira Kargeha Lîlît Arya Xelîl anî ziman ku Kargeha Lîlît di 2017’an de bi boneya 25’ê Mijdarê Roja Cîhanî a têkoşîna li dijî şideta beramberî Jinan bi sponsoriya Desteya Çand û Hunerê ya Herêma Cizîrê hatibû vekirin û wiha got: “Kargeha Lîlît dema ku hate damezirandin li bajarê Amûdê bû, lê piştre cihê wê hate guhertin û li bajarê Qamişlo hate vekirin. Di kargehê de 9 jin ji pêkheteyên Ereb û Kurd kar dikin lê di demên pêş de wê zilam jî bi me re kar bikin, 5 ji me karê dirûtinê û 4 jin jî karên destan dikin û bi hev re dibin alîkar. Her wiha karê wan dirûtina cil û bergên gelêrî yên Kurd, Erebî û Suryaniyan û karên destane û kofî, kemer, şohî û her amûrên din ên ji bo cilên Kurdî tên çêkirin. Em li vir cil û bergên çanda Kurdî, kiras, qemîs û cilên ku em çêdikin û didin dikanên li bazarê karê dirûtinê. Ji bo danasîna cilên floklorî berhemên kargehê di mîhrîcan û pêşangehan de hatin pêşandan.”

**‘Armanca me zindîhiştina çanda kurdî ye’**

Arya Xelîl behsa armanca vekirina kargeha Lîlît kir û wiha got: “Armanca me ew e ku cil û bergên çanda Kurdî zindî bihêlin û folklora xwe yê kurdî vegerînin, her wiha bi vekirina vê kargehê re me xwest piştgiriya projeyên jinan bikin. Me xwest bibin alîkar û piştgiriya jinan bikin ta ku hewceyî ti kesekî nebin. Ji ber ku beriya niha tenê cil û bergên çanda Kurdî di cejna Newrozê de dihatin lixwekirin, lê di roja me ya îro de Kurd di hemû şahiyên xwe de cil û bergên Kurdî li xwe dikin”.

Rêvebira Kargeha Lîlît Arya Xelîl di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Hêviya me ew e ku hemû jin karibin li dû xewnên xwe bin û tişta ku dixwazin kar bikin û jêhatbûnên xwe derxînin, her wiha bi hêvî me ku her jinek hewil bide ku li dû xewnên xwe be û heta ku karibe hewcedarî ti kesî nebe. Beriya Şoreşa Rojava jinê nikarîbû xwe îsbat bike lê piştî şoreşê xwe îsbat kir û cihê xwe di nava civakê de girt.”



# Dengê çiyayî û resen; Tehsîn Taha

Stêrk Mihemed/Qamişlo




Hunermendê nemir Tehsîn Taha, di nav hunermendên muzîka kurdî de bi afîrîner û keda ku dayî xwedî cihekî taybet e. Ev hunermendê ku tevahiya jiyana xwe ji bo mûzîka kurdî bê navber derbas kiriye, îro jî bi deng û berhemên xwe ji pêşeroja mûzîka kurdî re dibe çavkanî. Hunermend Tehsîn Taha bi nexweşiya penceşêrê dikeve, piştî salek ji têkoşîna nexweşiyê di 28’ê Gulana 1995’an de koça xwe ya dawî dike.

Hunermend Tehsîn Taha di sala 1941’an de li navçeya Amediyê ya bajarê Dihokê ji dayîk bûye, ew hunermendekê kurd e, bi deng û stranên xwe yê bi bandor, bi nav û deng bû. Ne tenê di milê stranan de, herwiha di milê şanoyê, xwendin û siyasetê de jî gelek li pêş bû. Li hember zordariya rejîma Baas bê deng nedima û qebûl nedikir. Tehsîn Taha bi nexweşiya penceşêrê dikeve, piştî salek ji têkoşîna li hemberî nexweşiyê di 28’ê Gulana 1995’an de koça dawî dike. Stran û pêvejoya wî meşandiye heya niha bandora wê heye û hemû li ser rêça wî dimeşin.

**Çavê huneriyê li Amediyê vebû**

Tehsîn Taha, di sala 1941’an de li navçeya Amediyê ya Dihokê ji dayik dibe, di zaroktiya xwe de bi mûzîkê re mijûl dibe, her diçe dengê xwe bêhtir pêş dixe û di sala 1957’an de dema 16 salî ye bi kilama “Aşkere Nakim” bi awayekî profesyonel dest bi jiyana xwe ya hunerî dike.

Di sala 1960’an de li zanîngeha Bexdayê dest bi beşa Hunerên Xweş dike, salên zanîngehê ji bo wî gelek tiştan bi xwe re tîne, hem di warê hunerî, hem jî di warê civakî de Tehsîn Taha di wan salan de gelek tiştan nas dike. Li gel xebatên mûzîkî, Taha di perwerdeya şanogeriyê de jî cih digire û di gelek lîstikan de wek şanoger cih digre. Tehsîn di wan salên xwendinê de li hemberî geşedanên civakî û siyasî bêdeng namîne û li dijî rejîma Baasê di xebatên siyasî de cih digire. Ji ber vê yekê tê binçavkirin û piştre jî ji bo demekê ji zanîngehê tê dûrxistin.Tehsîn Taha li aliyekê hunera xwe didomîne, li aliyê din jî xebatên xwe yên siyasî dimeşîne, di encama vê yekê de di sala 1963’an de tê girtin. Piştî ku efûya giştî derdikeve, ji girtîgehê derdikeve û vê carê zanîngeha xwe diqedîne.

Piştî ku zanîngeh diqede, Tehsîn Taha bi armanca pêşxistina deng û hunera xwe derbasî Mexmûrê dibe û li wir dest bi mamostetiya mûzîkê dike. Di vê pêvajoyê de ji ber naveroka berhem û stranên xwe gelek caran ji aliyê rejîma Baasê ve tê binçavkirin, lê tu binçavkirin gav ji biryardarî û sekna Tehsîn Taha paşve navêje.

**Kar û xebatên hunerî**

Salên 1960’an ji bo hunera Tehsîn Taha salên girîng bûn. Ji destpêka 1960’an heya 1970’an di radyoya Bexdayê de nêzî 120 berhemên Tehsîn Taha tên guhdarkirin. Ji bona Taha salên pir giring bûn, lewra di wan salan de ne hêsan bû ku ewqas stranên kesekî di radyoya navdar a Bexdayê dê bên guhdarkirin. Tahsîn Taha di stranên xwe de bi taybet cih dide jiyana li gundan û koçberiyê, lewra rastiya ku li gundan dihat jiyankirin û serdemên jiyana koçberiyê ji bo raste rast bandor li hestên Tehsîn Taha dikir, ew hestên ku dilê wî bi kul dikir jî, wek awaz û lorînan diherikîn zimanê wî.

Di sala 1970’î de dizewice û dibe bavê çar zarokan. Li aliyekî jî bênavber xebatên xwe yên hunerî didomîne. Heya wan salan bi dehan stranan tomar dike û di têgihiştina bi sedan xwendekarên mûzîkê de mamostetiyê dike. Eşqa xwe ya şanogeriyê jî bernade, di navbera salên 1976 û 1979’an di lîstikên bi navê “Robarê Jiyanê, Deriyên Jiyanê û lîstîka Şoreşê” de derdikeve ser dikê û di vî warî de jî hunera xwe pêşkêşî hezkiriyên xwe dike. Di kêliyên jiyana Tehsîn Taha de li gel hilberînên hunerî, sekna wî ya şoreşgerî jî derdikeve pêş. Sekna xwe ya siyasî ku di salên zanîngehê de nîşan dida, di salên 1960’an de bi tevlîbûna rêxistina pêşmergeyan dimeşîne. Di sala 1961’an de li dijî rejîma Baas bi pêşengtiya Mistefa Barzanî di rêxistina pêşmerge de cih digire û şer dike, lê belê piştî ku tevger têk diçe, Tehsîn Taha stranekê bi navê “Ey Felek” dinivîse. Di vê stranê de hunermendê kurd hestên xwe yên li hemberî vê têkçûnê dilorîne.

**Bi civakê re mijûl dibû**

Tehsîn Taha xwedî dengekî delal bû. Dikaribû bi dengê jiyana xweş û dewlemend derbas bike, lê belê baş dizanîbû ku rastî ne ev yek e. Bawer dikir ku kesekî hunermend divê li dijî pirsgirêkên civakî, zilm û zordestiya li ser gel tê meşandin bibe xwediyê sekneke têkoşer. Bawer dikir ku huner encax bi rastiya gel, bi heqîqeta civakê re bi wate dibe û temam dibe, bi vê bîr û baweriyê li gel ewqas binçavkirin, girtin û zehmetiyan li aliyekî hunera xwe dimeşand, li aliyê din jî, têkoşîna xwe ya jiyanake azad û bi rûmet dimeşand, ev sekn û biryardarî hêz û hêvî dida wî, ev hêz û bawerî jî di hilberîna hunerî de ji wî re dibû çavkaniya herî giranbûha. Tehsîn Taha di jiyana xwe ya hunerî de li gel afirandina bi dehan berheman, bi dengên navdar ên wekî Erdewan Zaxoyî, Elbirt Nayîl û gelek hunermendên din ên kurd re deng dide gelek berhemen û kilaman dibêjin.Di 13’ê Adara 1994’an de Tehsîn Taha wekî gelek caran, dîsa ji bo pêşandineke mûzîkî bi hunermendên wek Eyşe Şan, Seîd Gabarî, Gulbihar û Salîm Helebî re derbasî Holandayê dibe.


**Ji ber nexweşiyê jiyana xwe ji dest da**

Beriya ku qonser bê lidarxistin Tehsîn Taha aciz dibe û wî radikin nexweşxaneyê, li ser vê acizbûnê tê tespîtkirin ku nexweşiya penceşêrê lê peyda bûye, nêzî salekî li nexweşxaneyê dimîne. Tehsîn Taha li wir di 28’ê Gulana 1995’an de diçe ser dilovaniya xwe. Piştî ku jiyana xwe ji dest dide, di 4’ê Pûşbera 1995’an de li Dihokê tê oxirkirin.

Di encama keda wî di jiyana hunerî de 8 albomê awazan diafirîne, di van alboman de cih dide bi dehan kilamên wekî ‘Ey Felek, Bêrîvanê, Rabe Cotyar’ di van alboman de gelek stranên ku îro jî ji hunera kurdî re dibin çavkanî, her wiha hêjayî gotinê ye ku gelek navên tirk ên ku xwe wek hunermend nîşan didin jî berhemên Tehsîn Taha dizîne û ji xwe re kirine çavkanî.

# Helbesta Rêber Apo ji zarokên Rihayê re

Asya Weşûkanî




Rêber Apo di helbesta xwe ya ku ji 195 zarokên Ruhayê re, bersivandiye de dibêje ku rayedarê girtîgehê bi dengekî nizim; got ku name ji tere hatine û name radestî min kirin û dema ku naman vedike gelekî kêfxweş dibe û dibêje; zarokno hûn bixêr û xweşî hatine û xîtabî tevahî zarok û ciwanan dike û ji wan re dibêje; hûn di van kêliyan de li hawîrdora minin û dilê min geş dikin û ji wan re, hestê xwe yê dewlemend tîne ser ziman û rave dike û weke ku çawa di salên rabirdû de li paytexta Suryeyê, Şamê bi zarokan re diyalog dikir careke din bi zarokan re; diyalog dike û dibêje: Hûn li ser gulan hatine û bi dilekî fireh weke, deryayan wan pêşwazî dike û kêfxweş dibe û dema ku mirov li helbesta Rêber Apo û hestên wî ên, dewlemend guhdar dike mirov hestê xwe pir lawaz û ji manewiyatê; qut dibîne û ev jî encama bandorbûna bi pergala, desthilatdar û siyaseta wê ya ku mirovan dike, bejin buhust dibîne. Dema ku mirov rastiyên wiha hîs dike û dikeve nava şiroveyan de wê demê mirov dibe xwedî qinyata ku; gerek vereşîna mirov were çêkirin ji bo ku ew jahra ku bi navê şerbeta pergala desthilatdar û fînas peran vexwariye û ji rastiya xwe û civakê dûr ketiye û bûye yê wê pergala dilreş û gemarî. Rêber Apo her maye ew mirovê xwezayî û dilpak, ku ji xweza û mirovan hezdike û canê xwe ji wan re dike parastin û mertal û her hewil dide ku jiyaneke wekhev û azad ji mirovahiyê re sazûman bike û wan derxîne ronahiyê. Rêber Apo ew Rêberê ku her li ser xweza û civakê dihizire û ji bo çareserkirina pirsgirêkên wan; têkoşîn dike û niha jî ketiye nava hewildana çareseriya, aşîtiyane û demokratîk. Rêber Apo ji bo ku dawiyê li şer û gengeşeyên ku qet, pêdivîya gelan bi wan tuneye bîne û wê hişmendiya zayendeperst, neteweperest, olperest û dewletperest ên ku dema xwe tijî kirine bi dawî bike.

Rêber Apo temînata jiyana wekhev û azad e. Ez tekez dikim ku ger têkoşîn û keda Rêber Abdullah Ocalan, ne baya gelo wê rewşa gelê Kurd û gelê Tirk çawa ba? Bi rastî dema ku mirov li ser şer û gengeşeyên li Kurdistan, Rojhilata Navîn û Cîhanê dihizire wê demê mirov dibîne ku dirindebûn û hovîtîya hişmendiya desthilatdar û tundrewiya wê gihaştiye pileyeke gelekî xeternak û weke ku çawa hevsengiya di navbera zayendan de hatiye xerab kirin, her wiha hevsengiya xwezayê jî hatiye xerab kirin û wiha be gerdûn di xeteriyê de jiyan dike û mirov dikare bibêje ku hebûn tev jî di nava xeteriyê deye. Careke din jî ez tekez dikim ku dibêjim ku peyama, dîrokî ya Rêber Apo jî sedema xwe ewe ku dawiyê li xeteriya li ser mirovahiyê û xwezayê bîne û pergala Civaka Demokratîk, Ekolojîk li ser bingeha wekhevî û azadiya jinê bibe.

Weke ku têye zanîn Rêber Apo 52 salin ku qala çareseriya, pirsgirêka Kurd û Tirkan dike û niha jî dibêje: Pirsgirêk gerdûniye û ji bo aşîtiyeke bingehîn hemû, jiyana xwe weke Rêber, feylesuf û alimekî xistiye xizmetê de û her hewildaye ku civaka siyasî û exlaqî avabike, ji bo ku mirovahî haj li xwe bibe û hinaseke azad bikişîne û bibêje ku; ez heme û jiyan dikim ji ber ku jiyana heyî weke dojehê lêhatiye û di nava jan û êşan de jiyan dikin. Tekez gerek were zanîn ku têkoşîna Rêber Apo ya 52 salan her di xizmeta mirovahiyê de bûye û hîna jî; weke ciwanekî 30 salî jiyan dike û ruh, fikir û hestên xwe her zindî û şiyarin û dibêje ku ez ji her wextî zêdetir; ji aşitiya civakî bawerim û ez kar dikim û ev jî ji bo me weke Kurd û nexasim weke jin, perspektîfên demê ne ku em xwe li ser wan bi rêk û pêk bikin û pileya têkoşîna xwe bilind bikin. Bijî Rêber Apo. Bijî yekitî û xuşk û biratiya gelan. Jin jiyan azadî.

## Entustrîkirina Çandê



REMEZAN OLÇEN

Di dîroka modern de, çand û huner bi awayekî zêde ji bo tanzîmkirina pergala hegemonî ya kapitalîstî hatine bikaranîn. Theodor Adorno, yek ji avakarên Ekola Frankfurtê ye. Camêr serê xwe pir bi vê meselê êşandiye. Heta berhemekê wî yê bi nave Endustrîkirina Çandê heye ku sernavê vê maqaleyê jî em ji wê berhemê girt. Adorno li ser mezinbûna endustriya çandê re rexneyên girîng dike. Li gorî Adorno endustrîkirina çandê weke rêbaza pûçkirina wê pênase dike.

Ramyarekî din ê ku em ê li ser vê babetê ji fikrên wî sûd bigrin Rêber Apo ye. Rêber Apo di parêznameya Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk cîlda 5’emîn de li ser babeta çandê analîzên kûr dike. Ew emr û temên çandê dibe destpêka mirovahiyê. Çandê bi civak, dîrok û siyasetê re analîz dike. Bi analîzên xwe re rexneyeke nû û tund li ser asîmîlasyonê û xizmeta çanda endustrîkirî dike ku ev pergala kapîtalîst xurt kirine. Heta veguherandine împaratoriyekê bê sînor.

Dîtina Adorno

Di çarçoveya fikrên Adorno de, çand di şiklê hunerê û medyayê de bûye çarçoveya rêxistinê ku jiyanê dike “standardize” û nexweşiyeke modern li ser şexsiyeta mirovan ava dike. Huner tê bikaranîn ji bo domdariya pergala kapîtalîst. Ev pergala han xwe bi hunera çanda endustrîkirî dixe ewlehiyê. Ji lêpirsînên civakê xwe emîn dike û bi vî awayî civakê dike bikirê çand û hunera endustrîkirî. Hunera vê çanda ji esasa xwe dûr ketî dike cureyeke rêbaza kontrolkirina civakê ya bi rêya xerckirin û mezaxtinê.

Bi asîmîlekirina çandê xwe tehkîmkirina îqtîdarê

Beramberî van fikrên Adorno, Rêber Apo dîtina xwe ya çandê wekî çavkaniyeke resen ên xwecihî û azadiyê diyar dike. Li gorî wî, kapitalîzm çandê asîmîlê dike û ew dikare bi rêya medyayê û pergalên edebî, pergaleke ku jiyana civaka têkoşer qirêj dike, peyda bike. Ji bo wî, çand ne tenê huner e, pê re nasname, mêjû û xebata demokratîk e. Van analîzên Rêber Apo têkiliyeke girîng bi civaka Kurd û îradeya çandê ya xweparastî re hene.

Rizgariya ji çanda endustrîkirî

Li aliyekî dîtinên Adorno hene ku mirov dikare ji bo teşxîskirina kapîtalîzm çawa xwe bi çanda endustrîkirî gurçûpêç dike; li aliyê din reçeteya Rêber Apo heye ku ew jî dixwaze civak bi çand û ziman çawa jiyanê demokratîk û azad bike. Yan wê çand li ser asas û koka xwe bimeşe yan jî wê bi hale xwe yê heyî di xizmeta pergala serdest a kapîtalîst de be ku kapîtalîzm pê pûş bikute eyarê mirovahî û civakê.


# Zanîngeha Rojava; Beşa Endezyariya Mîkatronîk û Peywendiyan

Zanîngeha Rojava ku di 20'ê Mijdara 2016'an de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye avakirin gelek beşan di nava xwe de dihewîne; yek ji wan jî Beşa Mîkatronîk e ku ji sala 2019'an ve hatiye vekirin û di aliyê avakirina kadroyên Endezyariya Mîkatronîk yên profesyonal de gavên girîng avêtine.

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Yek ji destkeftiyên Şoreşa Rojavayê Kurdistanê serkeftina sîstema perwerdê û zimanê dayîkê bû. Ji destpêkirina bi astên elfebeya Kurdî ya ku ji 3 astan pêk dihat, niha bi zimanê dayîkê peymangeh, zanîngeh û macister tê xwendin. Bi destpêkirina şoreşê re yekemîn zanîngeh li Herêma Efrînê ya niha dagirkirî ye di 26'ê Tîrmeha 2015'an de hate avakirin. Piştre li Bajarê Qamişlo Zanîngeha Rojava 2016'an, Zanîngeha Kobanê 2017'an û Zanîngeha El Şerq li Reqayê 2021'an de hate vekirin.

Bi pêşveçûnên ku di aliyê sîstema xwendinê de hatine kirin re, yek ji wan jî zêdekirin û berfirehkirina fakulte û beşên zanîngehê bûn. Di çend salên dawiyê de li kêlek fakulteyên bingehîn gelek fakulte û beş li her sê zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatin avakirin. Li Zanîngeha Rojava bi taybet gelek fakulte û xebatên girîng her wiha danûstandinên bi zanîngeh û welatên derve re hatin meşandin.



**Beşa Mîkatronîk di Zanîngeha Rojava de**

Mîkatronîk di sala 2019'an weke peymangeha teknîkî a Mîkatronîk hate vekirin. salên xwendinê 2 sal û nîv bûn. Piştî pêşveçûna di aliyên xwendinê û zêdebûna derbasbûna xwendekaran ji bê beşê re. Di sala 2022'an de veguherî beşek ekedemîk girêdayî Fakulteya Zanistên Xwezayî û Teknolojî bi (Beşa Mîkatronîk) ku dest bi derçûn û avakirina endezyarên xwediyên pileyên Bekeloriyos di Endezyariya Mîkatronîk de.

**Beşa Mîkatronêk ji van endezyariyan pêk tê**

Endezyariya Mîkanîkî- Endezyariya Elektrîk û Elektronîkî- Endezyariya Bernamekirin û Kontrolê

Ev entegrasyon hêza xwendekar û yên derçûyî di aliyê pêşxistin û xulqandina sîstemên zekayî de roleke girîng dilîze ku di beşên pêşesazî, çandinî, pijîşkî û enerjiyê de xwedî rol bin.

Hejmara xwendekarên vê beşî nêzî 100 xwendekarî ye, her wiha ji dema veguhartina ji peymangeh bûye beşa zanîngehê 23 xwendekar derçûne. Her wiha van xwendekaran li ser gelek projeyan kar kirin ji wan jî ev proje bûn:

**Pirojeyên xwendekaran**

Robota şopandina rêyê, xwendina xêza hilberînê, mala zekayî, çêkirina robotê ya kontrolkirî, Lucid vr, sîstema elektronîkî ji bo alîkariya astengdaran, scorpion he xapod robot û hafîzeya elektronîkî.

**Projeyên ku di laboratuarên endezyariya mekatronîkê de hatin pêkanîn wiha ne:**

Laboratuara Solid works- Laboratuara Kontrolkirina Otomasyonê- Laboratuara Sîstemên Robotîk.

Her wiha atoliyên perwerdê ku bi alîkariya şîrketa Acorn a ku di fakulteyê de kar dikir. Di heman demê de kursên taybet ên Beşa Endezyariya Mekatronîkê roleke sereke di pêşketina van projeyan de leyist.

**Armancên fakulteyê**

Amadekirina kadroyên endezyariyê yên pir-jêhatî ku dikarin di warên cûda de bixebitin, di nav de robotîk, otomasyon, kontrola pîşesaziyê û sîstemên jîr (zekî).

Piştgiriya pîşesaziya herêmî bi rêya pêşxistina xetên hilberîna jîr û zêdekirina karîgerî û berhemdariyê.

Bersivdayîna pêdiviyên Şoreşa Pîşesaziyê ya Çaremîn, ku xwe dispêre entegrasyona elektronîk, mekanîk û bernamesaziyê (bermece).

Vekirina asoyên nû ji bo mezûnan da ku di sektorên nûjen de wekî zekaya çêkirî, otomobêlên elektrîkê û cîhazên bijîşkî yên jîr.

Teşwîqkirina lêkolînên zanistî û nûjeniyê di warên teknîkî yên pêşketî de wek çapkirina 3D û sêwirana mekanîkî ya jîr de.

Beşdarbûna di veguherîna dîjîtal a sektorên pîşesazî û xizmetguzariyê de.

**Beşa Endeziyariya Elektronîk û Peywendiyan**

Beşa Endeziyariya Elektronîk û Peywendiyan(Itîsalat û elektroniyat) di sala 2019'an de weke peymangehekê hat damezrandin. Paşê ji ber guhertina sîstema xwendinê, pirbûna xwendekaran û pêşveçûna binesaziya peymangehê, di sala 2022'an de veguherî beşekî serbuxwe girêdayî Fakulteya Zanistên Xwezayî û Teknolojîk. Ji destpêka avakirina Endeziyariya Ilktronîk û Peywendiyan ve heta roja îro 55 xwendekar lê hatine tomarkirin. Herwiha hejmara xwendekarên ku bi sîstema peymangehê derçûne 15 ne, wan xwendekaran hin proje di nav xwendina xwe re pêşkêş kirine, weke destnîşankirina asta pişafteyan(tiştên di rengê avê de), sazkirina daraya hişyariyê, çêkirina qebekirina deng, dareya hîskariyê, çêkirina erebeya li ser rêgeheke çêkirî û hwd. Ev beşa ku li ser çar salên xwendinê tê dabeşkirin, xwendekar bi dirêjay 4 salan re zêdeyî 50 metriyalên girêdayî qada xwendina xwe dibin.

**Armanc û şêwazê xwendinê**

Ji bo vekirina deriyê derfetê li pêşiya fêrkirina xwendekaran di qada teknolojîk, hem jî ji bo ku xwendekar bizanibe çawa bi rengekî bispor hemû aliyên teknolojiyayê lêkolîn bikin û kar bînin. Herwiha hemû warên teknolojî yên xwecihî li pêş bixin, di heman demê de amadekirina kesayetên bispor di warê sîstemên peywendiyan û endeziyariya wê de. Şêwazê xwendina wê teorîk û piratîk e, lê bêhtirî wê, hewcedarî bi taqîgeh, sîstemên pêşketî û teknîkê heye. Lewma jî Beşa Endeziyariya Ilktronîk û Peywendiyan demekê tevkarî bi Kampaniya Acorin re kir û stajên xwendekaran hatin dayîn û ev tevkarî bi dawî bû. Ji ber kêmderfetan ev beş êdî rastî astengiyan tê û pêvajoya xwendinê hatiye rawestandin. Lê Beşa Endeziyariya Ilktronîk û Peywendiyan amadekariyên xwe dike ku teknîk û taqîgehan bi dest bixe da ku perwerde bi rengekî serkeftî bê dayîn. Di heman demê de hewldan hene ku rêveberiya beş û fakulteyê tevkariyê bi kampaniyên xwecihî re mîna ya Rcell re peywendiyan çêbike da ku xwendekar jê sûd werbigirin.



**Dema Xwepêşxistinê**

**Hafiz Ahmet Turhalli**

Bizava Kurdî ya ku bi dehê salan e didome, derbasî qonaxekî nû bû. Qonaxa heta neha qonaxa xwe ravekirina cîhanê bû.

Lewra Kurd ji hêla sîstema cîhanê ve hatibûn kuştin, kefenkirin û binaxkirin. Hemû cîhanê sedsala berê bi lehevkirina lozanê, tunekirina Kurdan weke proje dabû pêşiya xwe. Milletê Kurd piştî vê biryara nebixêr, dest bi xweparastinê kir. Îsal sedsaliya Şêx Seyîdê Kale, piştî serîhildana Şex Seyîd,kuştin û qirkirina Kurdan dest pê kir. Bi taybet dewleta Tirkan, komelkujî pêk anîn.

Li beramber vê qirkirinê, Kurdan jî çek girtin û bi çekan li ber xwe dan. Van berxwedanan di dawiyê de ji bo Kurdan malwêranî, penaberî û kuştinên komî pişt xwe hiştin. Mezel û gorên rêberên Kurdan jî nayên zanîn. Bizava Kurdî ya hemdem, bi serpereştiya Rêber Abdullah Ocalan, dest avêt vê pirsgirêka giran. Wê bizavê ne di carekê de gel rakir ser piyan; berovajî wê, bi henek şagirtên ku di zanîngehên neyarên Kurdan de dixwendin, dest pê kir. Ev zanîngeh jî ji bo zarokên Kurdan cîhê helandin û tunekirina Kurdan bû.

Lê çerxa felekê di zanîngehên neyaran de ku zarok û ciwanên Kurdan qurbaniyên wan bûn, li wan zivirî. Çeka destê dewletê li dewletê vegeriya. Komeke ciwanên Kurd û henek hevalên wan yên Tirk, bi serpereştiya Rêber Abdullah Ocalan xwe rêxistin kirin.

Di paytexta Tirkan Enqerê de, tovê vê rêxistinê hatin rijandin û berê xwe dan Kurdistanê.

52 sal di ser vê tekoşînê re derbas bûn, gelek rêheval û serpereştên vê dozê hatin girtin û hatin qetilkirin, lê xwe radestî destê dewleta hov nekirin. Piştî şehîdkirina gelek pêşengên vê dozê, tevgera netewî ya Kurd, ji bo tolhildana heval û gelê xwe dest bi tekoşîna çekdarî kir û li seranserê Kurdistanê belav bû. Ji bo neyaran bû tirs û xofa mirinê, ji bo Kurdan bû êniya tolhildanê.

Serokê vê dozê bi hevkariya desthelatan dîl hate girtin, lê ev doz her çû mezintir bû. Neha ev doz bûye dozekî cîhanî. Serokê Kurdan yên berê hemû hatibûn qetilkirin û mezelê wan jî nayên zanîn. Lê serok Ocalan di tekoşîna xwe de rêyekî dîtir helbijart û rêxistina xwe wek Keştiyekî deryayê gîhiştand qeraxê avê. Ev bîst û şeş sale ku li Îmraliyê di bin tecrîdekî giran de dijî, rexmî wê jî rojeva Kurdistanê û Tirkiyê her ew diyar dike. Heta neha şerê çekdarî hate kirin û li gor demê ev amûr divê derveyî pirosesê were hiştin. Şerê çekdarî tenê pisporiya çekdarî dixwest, lê neha ev tekoşîn dikeve serdemekî nû ku em zêde têde neşarezane. Sîyaset, civak, aborî û zanist ji bo me henekî xerîbe. Lewre em 46 sale şerê çekdarî dikin. Neha dema xwenûkirin û xwe pêşxistinê ye. Divê hem kadirên vê rêxistinê û hem jî welatperwerên wê xwe ji bo dema nû baş amade bikin. Ev dema nû jêre hişmendiyekî nû û pêşketinekî kur lazime. Divê gelê me bi rêberên xwe û bi hêza xwe bawer bike. Îro tekoşîna gelê Kurd gihaştiye radeya xwe ya herî bilind.

Ger em karibin li gor vê guhertinê xwe pêş bixin, em ê karibin bê rijandina xwînê, rêberiya xwe ya Rojhelata navîn misoger bikin.

Kurd xwedan hêzekî, manewî û madî ne, tenê em karibin xwe veguherînin, serkeftin li benda me ye.

# 'Armanca me tevlîbûna astengdaran di nava civakê de ye'

**Diyala Nîdal\Qamişlo**

**Berdevka Rêxistina Nûdem Davyan Mehmûd diyar kir ku hejimara kesên atengdar li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê 42 hezar û 302 kes in û got, " Armanca me tevlîbûna kesên astengdar di nava civakê de ye."**




Rêxistina Nûdem di sala 2021`an de li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi armanca tevlîbûna astengdaran ji civakê re hate avakirin. Rêxistina Nûdem kar û xebatên xwe li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo kesên astengdar dide meşandin.

Girêdayî vê mijarê berdevka Rêxistina Nûdem Davyan Mehmûd ji Rojnameya me re axivî.

**'Nûdem li ser bingehê perwerdekirina civak û malbatê hate avakirin'**

Davyan Mehmûd anî ziman ku rêxistina Nûdem a amadekirin û geşedanên mirovî ya astengdaran bi hizra jineke kurd di sala 2020`an de ji aliyê komek jin ve hat damezrandin, herwiha bi rengekî fermî rêxistina Nûdem di sala 2021`an de hat avakirin û wiha got: "Armanca rêxistina Nûdem ew e ku kesên astengdar tevlî civakê bikin. Ji ber ew kesên astengdar jî beşek ji civakê ne û pêwîst e ku jiyana xwe mîna her mirovekî di civakê de jiyan bikin."

**'Dilxwazên me li tevahiya bajaran xebat didin meşandin'**

Davyan Mehmûd da zanîn ku hejimara kesên astengdar li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê 42 hezar û 302 kes in û wiha berdewam kir: " Di nava van kesên astengdar de gelek zarok û jin hene, herwiha saziyên ku xebatê ji bo wan kesên astengdar didin meşandin kêm in. Cihê rêxistina Nûdem ya bingehîn li bajarê Qamişlo ye û navendên din li Hesek, Tebqa, kampa Waşûkanî, Serêkaniyê û Helebê li taxa şêxmeqsûdê jî hene. Kesên ku bi mere bi rengekî dildarî kardikin ji bajarê Dêrikê heta Qamişlo hene û li Amûdê, Tiltemir û kobanê jî hene."

**'Saziyên ku ji bo astengdaran xebat didin meşandin kêm in'**

Davyan Mehmûd eşker kir ku zehmetiyên ku ew dikarê xwe de dibînin ji ber zêdebûna hejimara kesên astengdar, herwiha saziyên ku ji wan kesên astengdare xebat didin meşandin kêm in û wiha pê de çû: " Di heman demê de zehmetiyên ku em di karê xwe de dibîin ji ber rewşa herêmê ya ku niha tê de derbas dide. Di Sûriya nû de tu kesî ji bo kesên astengdar dengê xwe nekir û daxuyanî ji aliyê tu kesî ve nehatin dayîn. Pirojeyên me yên dema pêş em dixwazin navendên nexweşiyê mono fobî û navendên tedawiya fîzîkî ji bo kesên astengdar vekin. Me li bajarê Helebê navendên tedawiyên fîzîkî vekirin lê em ê di demên pêş de li bajarên din jî vekin."

**'Pêwîst e civak giraniyê bide kesên astengdar'**

Berdevka Rêxistina Nûdem Davyan Mehmûd axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Banga min ji civakê re heye ku giraniyê bidin kesên astengdar û ji wan kesan hezbikin. Herwiha ez bi hêvî me ku rêxistin mirovî jî bi kesên astengdare bibin alîkar."



# Li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê Rojnamegeriya Kurdî

**Rohat Bulut**



Ji bo her gel û netewekî, her wiha ji bo partiyên siyasî, saziyên ragihandin û weşanê hene. Bê guman ev ji bo gelê Kurd û partiyên Kurd jî derbasdar e. Dema em berê xwe didin dîroka çapemenî, ragihandin û weşangeriya Kurd a ku wekî sazîbûn derdikeve pêşiya me, Rojnameya Kurdistanê ye. Rojnameya Kurdistanê di 22'ê Nîsana 1898'an de li Qahîreya Misrê ji aliyê Mîqdat Mîthat Bedirxan ve dest bi weşana xwe dike.

Lê ji ber sextên Osmaniyan neçar dimîne ku li Cenevre, London û Folkestoneyê weşana xwe bidomîne. Rojnameya Kurdistanê 4 salan dikare xwe li ser piyan bigire û bi giştî 31 hejmaran biweşîne û di 14'ê Nîsan 1902'an de dawî li weşana wê tê. Armanca Rojnameya Kurdistanê pîroz bû û ji bo me gelekî girîng û dîrokî ye. Em wekî Çapemeniya Azad li ser wê bingha ku Rojnameya Kurdistanê ji me re ava kiriye kar û xebatê doza azadiya gelê Kurd û Kurdistanê dimeşînin. Îro em li ser wê kevneşopiyê têkoşîna doza Kurdî radigihînin.

Mirov dikare bêje dawiya serdema Împaratoriya Osmanî û ji salên destpêkê yên Komara Tirkiyey û heta niha ev zêdetirî sed salî ye ku gelê Kurd di bin tundiyeke mizin de ye. Bi damezrandina Komara Tirkiyeyê û pergala netewedewletî êdî înkara Kurdan dest pê dike. Dibistan dihatin girtin û Kurdî dihat qedexekirin. Xebata bi Kurdî zehmetir dibû. Li hemberî zilmê serhildanên Koçgirî, Şêxseîd, Agirî û Dêrsimê pêş ketin. Ev serhildan jî bi têkçûnê encam bûn. Wekî berdewamiya Osmaniyan dewleta Tirk jî dest bi tepisandina serhildan û raperînên Kurdan kiribû. Pêşengên serhildanan dihatin darvekirin û mişextin.

Li aliyekî polîtîkayên red û înkarê, li aliyê din jî qirkirineke fîzîkî li ser gelê Kurd hebû. Lê li dijî van polîtîkayan jî nivîskar û rewşenbîrên Kurd bi xebatên kovargerî û rojnamegeriyê hewildidan ku bibin dengê gelê xwe. Mirov dikare bêje Serhildana Agirî di nav serhildanên Kurdan de ya herî rêxistinkirî ya siyasî bû. Her wiha bi mijara me ve jî girêdayî di wê serdema serhildana Agirî de rojnameya bi navê "Agirî" tê weşandin. Bi taybejî ji bo şervanên Kurd ev weşan gelekî girîng bû. Heke mirov di dîroka çapemeniya Kurdî de cih nede vê rojnameyê bawerim dê aliyekî wê kêm bimîn e. Belê ji Rojnameya Kurdistanê heta niha bi sedan rojname, kovar, radyo, tv û hwd. weşanên Kurdî dibe dengê gelê Kurd. Em dixwazin li vê derê bi kurtasî çend weşanên Kurdî yên ku mohra xwe li dîrokê xistine bi bîr bixin. Bi taybetî jî piştî ku Celadet Alî Bedirxan cara yekemîn di 15'ê Gulana 1932'an de bi alfabeya latînî Kovara Hawarê derxist, êdî rewşa weşangeriya Kurdî jî diguher e. Ji xwe piştî Hawarê di sala 1940'î de derketina Kovara Ronahî êdî hîmê rojnamegeriya Kurdî li çar aliyên Kurdistanê dide rûniştin. Ji ber ku emê hinekî li ser rewşa weşangeriya Kurdî ya li bakurê Kurdistanê rawestin pir zêde naxwazim bikevim nav hûrguliyên giştî. Lê dixwazim li vir Rojnameya Riya Teze, Rojî Kurd û Radyoya Erîvanê jî bi bîr bixim ku ji hemû weşanên Kurdî re bûne çira.

Li bakurê Kurdistanê rewşa weşangeriyê hêsan nîne. Belê dîrok dirêj e û weşanên Kurdî jî li ser rêça Kurdistanê dimeşe, lê belê dema em li salên 70yî dinêrin û bi taybetî jî piştî avabûna Tevgera Azadiya Kurdistanê êdî çapemenî xwe zêdetir xurt dike û ji aliyê gel ve rastî eleqeyek mezin a pêbaweriyê tê. Di vê nivîsê de emê hinekî li ser weşanên Kurdî ên ku mohra xwe li rêveçûna dîroka Kurd û Kurdistanê xistine, her wiha girîngiya wan a ji bo Çapemeniya Azad rawestin.

Heke bi kurtasî mirov behsa van weşanan bike; Di sala 1979'an de "Serxwebûn" dest bi weşana xwe dike. Di sala 1980'ê de vê carê bi pêşengiya Mazlûm Dogan Kovara "Hawar" li Zindana Amdê dest bi weşana xwe dike. Tevahiya kovar bi destan tê nivîsîn û hêj jî ev Kovara Hawarê li Zindana Amedê ji aliyê girtiyên siyasî yên ji doza Azadiya Kurdistanê girtîne ji sê mehan carekê dertê. Ev kovar di heman demê de yekemîn weşana ku li zindanê dertê ye. Di sala 1990'î de "Halk Gerçegi" yekem car li Stenbolê dest bi weşana xwe kir. Di heman salê de "Yenî Ulke" derket. Rojnameya Yenî Ulke dibe yek ji rojnameyên ku têkoşîna gelê Kurd radigihîne û kiryarên dewletê yên li ser gel teşîr dike. Her wiha yek ji kovara ku em bi bîr bixin jî Kovar "Ozgur Halk" e. Di sala 1990'î de, "Ozgur Halk" dest bi weşana xwe kir û heta salên 2014-15'an jî wşana xwe domand. Ev kovar jî di têkoşîna azadiya Kurd de risteke girîn bi cih anî. Li aliyê din di sala 1992'an de bi navê "Ciwanên Welatparêzên Şoreşger" heftenameyek ji bo ciwanan derket. Xebatên vê kovarê jî hêj didome.

Lê belê polîtîkayên dewletê yên red û înkarê dibe sedem ku tundiya li ser weşanên Kurdî zêde bibe. Hêzên dewletê him di warê siyasî de tunekirin pêş dixist, him jî bi qanûnî dixwes li ser navê Kurd û Kurdî tiştekî nehêlin. Bi hêza xwe ya leşker û polîsan jî welatparêzên Kurd, rewşenbîr, nivîskar û rojnamegerên Kurd digirtin, dikuştin û di îşkenceyên giran re derbas dikirin. Her wiha destûr nedidan ku kes bi zimanê Kurdî biaxive, binivîse û bixwîne. Her kovar, pirtûk û rojnameya ku behsa Kurdan bikira, têkoşîn û azadiya gelê Kurd binvîsanda ji nivîskarên wan bigire heta xebatkar û xwediyê wan weşanan di îşkenceyên giran re derbas dibûn û dihatin girtin û hin ji wan jî dihatin Kuştin. Weşan dihatin qedexekirin û girtin. Di rewşeke wiha de jî di sala 1992'an de Rojnameya Yeni Ulke ji ber teşîrkirina polîtîkayên dewletê hat girtin û bi navê "Ozgur Gundem" weşana xwe domand. Bê guman di vê serdemê de kuştinên kiryar nediyar pêk tên. Serdema êrîşên dijwar e. Ozgur Gundem tê girtin. Di 10'ê Kanûna 1993'an de hemû xebatkarên rojnameyê hatin binçavkirin.

Lê Çapemeniya Azad a Kurd dev ji têkoşîna xwe bernade. Di sala 1994'an de "Ozgur Ulke" dest bi weşana xwe kir. Xeteke wê ya pir zelal, pir radîkal hebû. Rojname di 3'ê Kanûna 1994'an de hat bombekirin û yek ji xebatkarên wê Ersîn Yilmaz şehîd ket. Tevî vê yekê jî rojnameyê weşana xwe domand. Li aliyê din ji ber zext, tundî, girtinan mirov dikare bêje bi dehan kovar û rojname hatin girtin û li şûna wan yên nû vebûn. Hin ji van ku em li vê derê rêz bikin navê wan wiha ne; "Yenî Polîtîka" Yenikapi' "Demokrasî" "Ulkede Gundem", "Ozgur Bakis","Yenî Gundem" "Yedîncî Gundem", "Yenîden Ozgur Gundem", "Demokrasî" û "Yenî Yaşam". Ev weşanên ku me li jor rêz kir hemû jî weşanên Kurdî ne, lê bi zimanê Tirkî derketine.

Ligel kovar û rojnameyên kurdî yên bi zimanê Tirkî di 22'ê Sibata 1992'an de Rojnameya Welat dest bi weşanê dike. Bi Rojnameya Welat a xwerû bi zimanê Kurdî re êdî rewşa rojnamegeriya Kurdî diguhere û wekî ronesansa Rojnamegeriya Kurdî mirov dikare pênase bike. Rastiya ku tevahî bi Kurdî ye, deng veda. Hejmara yekem 20 hezar heb hat belavkirin. Lê belê piştî 115 hejmaran ew jî ji aliyê dewletê ve hat girtin. Bi girtina Rojnameya Welat re rojnameya "Welatê Me" û bi girtina Rojnameya Welatê Me re jî Rojnameya Azadîya Welat di sala 1996'an de dest bi weşanê kir. Rojnameya Azadiya Welat a ku heftane weşanê dike di 15'ê Tebaxa 2006'an de dibe rojane. Lê di vê navberê de jî gelek caran rojname hatiye girtin û bi navên; Hawer, Rojev, Rojeva Welat, Dengê Welat û hwd. weşanên xwe domandiye. Dîsa piştî girtina Rojnameya Azadiya Welat a di sala 2016'an Rojnameya Rojeva Medya, E-Rojname, Rojnameya Welat, Welat weşana xwe domandiye. Piştî girtina van rojnameyan jî niha Rojnameya Xwebûnê vê kevneşopiyê didomîn e.

Piştî kovar, rojname û televîzyonan em dibînin ku di warê ajansan de jî sazîbûna rojnamegeriya Kurdî pêş dikeve û rojana hêza xwe mezin dike. Di 4'ê Nîsana 2002'an de Ajansa Nûçeyan a Dîcle (DÎHA) ava dibe û di demek kin de li bajarên Bakur û metrepolên Tirkiyeyê tora xwe ya nûçeyan berfireh dike. DÎHA jî di sala 2016'an de tê girtin û li şûna wê DÎHABER ava dibe. DÎHABER jî tê girtin vê carê bi Ajansa Mezopotamyayê weşana xwe didomîn e.

Em dinêrin ku di 8'ê Adara 2012'an de Ajansa Nûçeyan a Jin (JINHA) ku ajanseke nûçeyan a navenda wê li Amedê ye tê damezrandin. JINHA, yekemîn ajansa nûçeyan a ku li Kurdistan û Tirkiyeyê bi xebatkarên jin xebat û têkoşîna jinê pêş dixe. JINHA jî di sala 2016'an de tê girtin û li şûna wê Şûjin weşanê dike û pişît ku Şûjin jî tê girtin niha bi JinNewsê xebat û têkoşîna jinê ya di ragihandinê de didome.

Di sala 2016'an de jî li dijî Çapemeniya Azad a Kurd û muxalîf êrîşeke mezin pêk hat. Ajans, rojname, Kovar, televîzyon û radyoyên ku hatin girtin; Ajansa Nûçeyan a Dîcle (DÎHA) Ajansa Nûçeyan a Jin (JinHa) Rojnameya Ozgur Gundem, Rojnameya Azadiya Welat, Rojnameya Yuksekova Haber, Rojnameya Batman Çagdaş, Rojnameya Cîzre Postasi, Rojnameya Îdîl Haber, Rojnameya Guney Expres Gazetesî, Rojnameya Prestîj Haber, Rojnameya Urfanatîk, Rojnameya Kızıltepe'nin Sesî, Kovara Tîroj, Kovara Evrensel Kultur, Kovara Ozgurluk Dunyasi. ÎMC TV, Azadî TV, Jiyan TV, Van TV, TV10, Denge TV, Zarok TV, Ozgur Gun TV, Mezopotamya TV û hwd. YON Radyo, Ozgur Radyo, Radyo Ses, Radyo Dunya, Ozgur Guneş Radyosu, Radyo Karacadag, Radyo Rengîn, Gun Radyo, Patnos FM, Dogu Radyo û hwd.

Li vê derê em pêdivî dibînin ku wekî têbinî destnîşan bikin ku yek ji weşanên Kurdî ya li ser vê kok û kevneşopiyê zêde bûye Ajansa Welat e. Ajansa Welat di 27'ê Mijdara 2024'an de dest bi weşana xwe kir û yekem care ku ajanseke xwerû bi Kurdî weşanê dike ye. Bê guman wekî weşanên din kedkarên wê jî di şopandina nûçe û bûyeran de ji bo rasiyan ragihînin rastî êrîşan tên.

Bêguman ji derveyî van kovar, rojname, tv, ajans û hwd. bi sedan weşan hene ku em nikarin yek bi yek navên wan li vê derê rêz bikin. Lê armanca me ya ku ji bîrxistina van weşanan ewe ku yên rasterast bi êrîş û tundiya dewleta Tirk ve rû bi rû mane. Her wiha van weşanan ku her tim ji ber polîtîkayên dewletê hatine girtin û rastî cezayan hatine. Bi dehan kedkarên vê Çapemeniya Azad hatine girtin û rastî cezayan hatine. Her wiha bi dehan kedkar, nivîskar û rojnamegerên vê Çapemeniya Azadin ku ji aliyê vê dewletê ve hatine kuştin. Ewqas zêde ye ku zehmete mirov di nivîseke wiha de cih bide wan.

Ji Rojnameya Kurdistanê bigire heta niha çapemeniya Kurdî li ser vê hişmendî û bingehê xebatên xwe meşandiye. Çapemeniya Azad wekî duh, îro jî ji ber kar û xebatên xwe yên pîroz ên ku ji bo azadiya Kurd û Kurdistanê dike rastî êrîşên dewlet û desthilatiyê yên sîstematîk tê. Lê belê her kedkarekî Çapemeniya Azad di wê hişmendiya berpirsyariya xwe ya dîrokî ya ji bo azadiyê de ye. Lewma jî bi tu awayî gav şûnde navêje, ew al û pênûsa têkoşînê ya Miqdat Mîthat Bedirxan, Apê Mûsa û Gurbeteliyan li erdê nahêlin.

Ji salên 90'î ve ye bi dehan rojnameger ji ber zext, tûndî û polîtîkayên qirkirinê yên dewleta Tirk derxistine holê û ragihandine rastî êrîşan hatine û hatine girtin û di îşkenceyên giran re derbas bûne û hatine kuştin. Bi sedan rojnamevan di zindanan re derbasbûne û hêj jî rojnamevan tên giritin. Niha jî bi dehan rojnamevan di zindanên Tirkiye û Kurdistanê de dîl tên girtin. Em jî wekî şopdarên doza wan bi tu awayî dev ji vê têkoşîna wan bernadin hetanî ku ev têkoşîn bi azadiyê encam bibe.

# ‘Desthilata Şamê bi hişmendiya DAIŞ’ê komkujiyan li dijî gelên Sûriyê pêk tîne’

Berpirsa Komîteya Têkiliyan a Kongra Star Emîne Osê eşkere kir ku piştî ketina Rêjîma Baas bi hevkariya hêzên navdewletî desthilata Şamê hat ser desthilatdariyê. Herwiha ji dema hatina li ser desthilatdariyê, Sûriyê di nava aloziyan de jiyan dike û bi hişmendiya DAIŞ'ê komkujiyan li dijî jinan û tevahiya gelên Sûriyê pêk tîne.

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Di derbarê rewşa Sûriyê ya dawî û komkujiyên li civaka elewî û durziyan Berpirsayara Komîteya Têkilyan a Kongra Star Emîna Osê bersiva pirsê Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû.

**Desthildariya Şamê êrişên xwe li ser civaka elewî û durzî nedaye seknandin û ji xwe re rawa dibîne hun vê yekê çawa dinirxînin?**

Weke tê zanîn piştî ketina Rêjîma Baasbi armanca hevkariya hêzên navdewletî desthilata Şamê hate li ser deshildariya, herwiha xewin û xeyalên tevahiya gelê Sûriyê ew bû ku piştî ketina rêjîma Baas Sûriyeke wekehev û Dîmokratîkî were avakirin û her kesî kêfxweşiya xwe ji bo vê yekê daxuyakirin. Lê mixabin piştî hatina desthildariya li ser desthildariyê ew xewin û xeyalê gelê Sûriyê hatin şikandin. Ji ber ku ev desthildarî bi hişmendiya DAIŞ`ê komkujiyan li dijî jinan û tevahiya gelê Sûriyê pêk tîne. Em dibînin ku ev desthildarî di 8`ê Adar li dijî civaka Elewî gelek komkujî pêkanî û heta roja îro ev komkujî berdewam dikin û bi hiceta ku civaka Elewî girêdayî Rêjîma Bass. Di van demê dawî de di herêmên Şamê de jî li Cermane û Sehnayede gelek komkujî li dijî pêkhateyên dursî pêkanîn. Ev desthildariya bi vî rengî bi tu awayî nikare nasnameya hebû pêkhateyên ku li herêmê dijîn hebêz bike, ji ber ku Sûrî welatekî pir rengîne û gelek pêkhate lê jiyan dikin. ji ber vê yekê bi tu awayî gelê Sûriyê vê desthildariya bi vî rengî napejrînin.

Di heman demê de li gorî rêjeya navendên lêkolînên mafê mirovan ji destpêka komkujiyên li dijî civaka Elewî 4 hezar û 700 mirov hatin qetilkirin. Heta demekê raya giştî balkişand li ser vê yekê lê hate bêdengkirin dibin navê derxistina komîteyeka lêkolînan. Lê mixabin ji ber dirêjkirina vê komîteyê heta niha komkujî li dijî civaka Elewî ne hatine rawestandin. Desthilata Şamê derfet dît ku komkujiyên xwe li dijî Elewî û durziyan berdewam bike û bi rebazekê cudatir. Herwiha em dibînin ku ev desthilata Şamê êrişên li ser civaka Elewî û durziyan ji xwe re rawe dibîne.

**Bi erkdarkirina kujerê Hevrîn Xelef heman peyama komkujiyê ji bo gelê kurd jî tê dayîn.Herwiha xeteriya li ser jinan, gelan û bawiriyên li herêmê di asta jor de berdewame hûn ji bo wî dikarin çi bêjin?**

Desthildariya Şamê kesên sûcdar û dîroka wan pir tariya di nava rêvberiya xwe de erkedar dike, herwiha serçeteyên mîna Mihmed Casim Ebû Emşa û Hatim Ebû Şeqra ên ku destê wan di kuştina jinan û gelê Sûriyê de heye weke fermandaran di nava artêşa xwe de erkedar dike. Lewma me dîtî ku di vê dema dawî de serçeteyê girêdayî dagerkeriya Tirk û kujerê Hevrîn Xelef Hatim Ebû Şeqra weke fermandarê ferqeya 86`an li herêmên Dêr zorê, Reqa û Hesekê erkedar kir. Ev serçeyê ku mafê mirova binpêkiriye û bi hezara sûcê şer kirye û di asta navdewletî de kesekî teror e.

Di heman demê de heta niha encamên desthildariya Şamê ne hatine bi cîkirin û tu xebat ji bo wê ne hatine kirin. Ji ber vê yekê ev serçete bi rihetî bê ku werin cezakirin erkê di asta bilind de di nava artêşa desthilata Şamê de cihê xwe digirin. Ev dibe bingeh ku gelê Sûriyê û raya giştî baweriya xwe bi vê desthildariya bi vî rengî neyînin.

Ji ber ku ev desthildarî sûcdaran di nava rêveberiya xwe de erkdar dike. Herwiha ev xala ku li ser tê seknandin ku çi hevdîtinin çêdibin vê xalê tînin ziman û dibêjin pêwîst e hebûna van kesên biyanî û sûcdar di Sûriya nû de nebin.

Helbet ev kesên ku destê wan di xwîna gelê kurd û tevahiya gelê Sûriyê de heye bi tu awayî em van kesan di nava Sûriya nû de napejrînin û divê ku ev kes di asta navdewletî werin cezakirin. Ev bûyerên ku têne kirin encamên ku siyaseteke ne li hevkirineke civakî ya ku dimeşînin, herwiha desthilata Şamê li ser welatekî pir rengîn yek hişmedî ferzkiriye. Ji ber vê yekê niha Sûrî di nava aloziyeke mezin de jiyan dike û welatekî ku di nava aloziyan de jiyan bike wê bi tu awayî ew welat pêşnakeve û wê di aliyê aborî de hejariyeke mezin çêbibe. Welatê ku hejartî lê hebe DAIŞ xwe lê zindî dike û ev komkujiyên ku niha li dijî jinan û tevahiya gelê Sûriyê tê kirin, dibe zemîneke li pêşiya DAIŞ` ku xwe di Sûriyê de zindî bike.



**Deshildariya Şamê zextên li ser civak û jinan dixwaze Destkeftiyên Şoreşa Rojava bi têkoşîna li hemberê DAIŞ’ê gerdûnî bûbû. Îro carekdin dixwazin feraseta DAIŞ`ê zindî bikin, ew jî ji bo gelê Sûriyê û Bakur Rojhilatê sûriyê xeterîyeke mezine hûn wî çawa dinirxînin?**

Di pêvejoya 14 salan de QSD`ê YPG û YPG li hemberî DAIŞ`ê têkoşîn û berxwedaniyeke bêhempa da meşandin. Bi armanca ku destkeftiyên herêmê biparêzin,herwiha serkeftina têkbirina DAIŞ`ê di aliyê erdinîgarî de diyarî cîhan û mirovahiyê kirin. Cîhan bi tevahî bi hêza QSD`ê û têkoşîna gelê Kurd kêfxweşiya xwe diyar kir. Lê îro divê pêvjoyê de şerê pêkhateyan heye û pêvejoyeke ku desthilata Şamê îradeya gelê Sûriyê nasnake. Lewma em dibînin ku ev desthildarî îrade û mafê jinê di Sûriya nû de paşguh dike. Ruximî ku jinê têkoşîn û berxwewdaniyeke bêhempa di Sûriyê de da meşandin û gelek destkeftî bi destxistin, lê ewqas hevdîninên ku çêbûn desthilata Şamê mehsa rol û mafê jinê di destûra Sûriyê ya nû de nekir û vê yekê paşguh dike. Ji ber vê yekê pêwîst e ku jinên Sûriyê vê hişmendiyê ne pejrînin û asta têkoşînê bilind bikin.

**Peyame we çi ye?**

Helbet ev destihdariya ku mafê jinê binpêdike û roja komkujiyan li dijî jinan pêk tîne bi tu awayî jinên Sûriyê vê desthildariya napejrînin. Herwiha desthilata Şamê îradeya gelê kurd ji hebû aliyan ve napejrîne ne di aliyê destûrê û diyalokan de û hebû rêbazê ku destkeftiyan bê îrade bike bi kar tîne. Bêguman em weke herêmên Bakur Rojhilatê Sûriyê her dem ji bo diyalokê re amedene. Niha di vê demê de ji me tê xwestin ku em asta têkoşînê bilind bikin û xebatên xwe hîn zêde tir bikin. Ji bo ku em karibin di nava Sûriya nû de bi rola xwe bilîzin.

# Jiyaneke Baş Lê Belê Çawa?

**Sînan Cûdî**

Modernîteya kapîtalîst li deverên cuda yên cîhanê şopên wekhev dihêle: Talankirina xwezayê, hilweşîna tevna civakî, tecrîdkirina takekesan û serdestiya hemû qadên jiyanê ji aliyê dewletên navendî ve.

Li hember vê wêrankirinê, mirovên li deverên cuda yên cîhanê bi piştgirtina paşxaneya xwe ya dîrokî û bîranînên xwe yên çandî rêbazên nû yên jiyanê diafirînin. Ev lêgerîn ne tenê berxwedan in; ew di heman demê de pêşniyarek ji bo pêşerojê ye. Gelê Aymara ku li çiyayên bilind ên And’ê yên Amerîkaya Başûr dijîn, di heman demê de bi felsefeya xwe ya Suma Qamana, jiyanê diparêzin. Bi sedsalan e ku li dijî kolonîzasyon, asîmîlasyona çandî û dûrketina aborî têdikoşe. Tiştê ku Aymara ji “jiyana baş” fêm dikin ne fêde û refaha takekesî ye ku li ser xerckirinê disekine; Ev tê wateya jiyana li gor xwezayê, civakê û gerdûnê. Suma Qamana li şûna pêşbaziyê, hevbeşiyê pêş dixe;



hevsengî li şûna mezinbûnê; Ew li ser bingeha bi hev re jiyanê ye, ne li ser serdestiyê.

Nimûneyek paralel li dilê Rojhilata Navîn, li bakurê Sûriyeyê ku ji ber pevçûnan wêran bûye, derdikeve holê: Şoreşa Rojava. Ev modela ku di bin pêşengiya gelê Kurd de hatiye pêşxistin, armanc dike ku jiyanek li ser bingeha “modernîteya demokratîk” li dijî avahiya dewleta navendî, zayendperestiyê û wêrankirina xwezayê ava bike. Ev sîstem, ku li gorî ramanên Rêber Apo hatiye avakirin xwe dispêre civakê, ne li ser dewletê. Meclîsên gel û komun beşdarî pêvajoyên biryardanê dibin; Jin ne tenê tên parastin, ew rasterast di veguherîna desthilatdariyê de jî beşdar in. Hestiyariya ekolojîk di nav prensîbên damezrîner ên sîstemê de ye.

Her du model jî li dijî têgihîştina “yek jiyana rastîn” a modernîteyê, li ser orîjînalîteya xwe israr dikin. Gelê Aymara li dijî awayên hilberînê yên ji hêla dewletê ve ferzkirî û projeyên ku xwezayê dikin bazirganî têkoşîneke kolektîf dimeşîn in. Gelê Rojava jî di heman demê de li dijî hêzên wêranker ên wekî DAIŞ’ê û hewldanên dagirkirinê yên dewletên hegemonîk ên herêmî yên wekî Tirkiyeyê berxwedana xwe ya çekdarî û sivîl didomîne. Di her du rewşan de jî, civak parastina jiyanê ne, tenê wekî ferzek hebûnî, lê di heman demê de wekî berpirsiyariyek exlaqî û siyasî jî dibînin.

Lê ev model ne tenê modeleke parastinê ye; Ew çareseriyên afirîner jî pêş dixin. Suma Qamana erdê (di maneyekî de axê) wekî hebûneke pîroz dibîne, ne tenê wekî cihekî berhemdar; Ew bingehên exlaqî yên têkiliya ku bi xwezayê re were damezrandin ji nû ve pênase dike. Rojava jinan ne tenê wekî mijarên ku werin rizgarkirin, lê di heman demê de wekî pêşengiya ji nû ve avakirina civakê bi cih dike. Hewl dide bi rêya komun, kooperatîf û şêweyên keda kolektîf girêdanên civakî yên ji aliyê kapîtalîzmê ve hatine hilweşandin ji nû ve ava bike.

Astengiya herî mezin a ku ev modelên giştî pê re rû bi rû dimînin bêguman hişê dewleta navendî ye. Di her du mînakan de jî, dewlet hewl dide şêwazên jiyanê yên alternatîf nedîtî û bêfonksiyon bike. Çi wekî amûrek rasterast a tepeserkirinê an jî bi destwerdanên aborî û îdeolojîk. Prensîba Suma Qamana, ku di serdema Evo Morales de li Bolîvyayê bi destûrî hatibû naskirin, di salên piştre de di siya polîtîkayên aborî yên neoliberal de bêfonksiyon ma. Li Rojava, dorpêça leşkerî, ambargoya aborî û nebûna naskirina navneteweyî sînorên sîstemê diceribîne.

Tevî van hemû zehmetiyan jî, ev gel têkoşîna xwe didomîne. Ji ber ku ev têkoşîn ne tenê ji bo mafê jiyanê ye; Ew bersiveke kolektîf e ji bo pirsa ku çi cure jiyanê tê xwestin. Ahenga bi xwezayê re, wekheviya civakî, azadiya jinan û demokrasiya rasterast îro hem li bilindahiyên Andê û hem jî li qeraxên Firatê deng vedide. Gelek tişt hene ku ji hev fêr bibin. Aqilmendiya kevnar a gelê Aymara li ser xwezayê dikare bi pratîka şoreşgerî ya Rojava ya li ser bingeha rizgariya jinan re li hev bikeve. Tiştê ku di her du mînakan de derdikeve holê, hewldana gelan e ku bi xwe dispêrin rehên xwe yên dîrokî, nirxek mirovî ya gerdûnî ji nû ve hilberînin. Di vê serdemê de ku avahiyên dewletê yên navendî hatine astengkirin û pergala navneteweyî bi kirîzan re têdikoşe, çareserî ne di îdeolojiyên monîst de û ne jî di modelên ji jor ber bi jêr de ye. Çareserî di hêza xwerû ya gel û afirîneriya wan de ye di hevberkirina zanîna kevnar, bi têgihîştina nûjen a azadiyê re. Wekî ku Aymara dibêjin: “Suma Qamana” jiyaneke baş, lê bi hev re, di ahengekê de. Wekî ku Kurd dibêjin: “Jin, Jîyan û Azadî” jiyaneke azad, lê bi jin, xweza û komûnan re. Ev her du têgeh hem bîranînek in û hem jî bangek in ku cureyek din a jiyanê li ser Erdê mimkun e.



# Dîroka civaka Durzî; bawerî û avabûn

Durzî baweriyeke ku bi yekgirtina xwe ya navxweyî tê naskirin û bi yekbûna mutleq a Xwedê bawer in, herwiha li Sûriyê dîroka wan vedigere sedê salan. Peyva “Durzî” ji koka peyva “derz” hatiye. Di dîroka Sûriyê de rola wan a girîng heye, li kêlek wê jî ew rastî gelek zordestî, komkujî û êrişên olperstiyê hatine.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Durzî baweriyeke ku bi yekgirtina xwe ya navxweyî tê naskirin. Piraniya Durziyan li Sûriye, Libnan û Filistînê dijîn. Durzî xwedî alayeke taybet in. Li gorî tê texmînkirin hejmara civaka wan, nêzîkî yek milyon û 500 hezarî ye. Kokên dîrokî yên bawerî Durziyan vedigerin serdema şeşemîn xelîfeyê Dewleta Fatimî, Hakîm bi Emrîllah ku dema desthilatdariya wî ji sala 996’an a zayînî heta 1021’ê zayînî berdewam kir. Ev bawerî li ser destê Mihemed kurê Îsmaîlê Durzî yê ku koçî Şamê kiribû, hate damezrandin û li ser navê wî hat naskirin. Peyva “Durzî” ji koka peyva “derz” hatiye ku di zimanê Erebî de tê wateya kurên ku cil û berg durûtine çêdikin. Durzî ji Çiyayê Idlibê û Çiyayê Kurmênc bar kirine û li herêmên xwe yên niha belav bûne. Beşeke Durziyan jî Kurdên Canbolatî ne û ew Kurd in. Durziyet ayîn e û dûrî Îslamê ye. Gelekî taybet in û gelekî hevgirtî ne.



**Durziyan li Sûriyê roleke girîng di bûyerên dîrokî de lîstine**

Li Sûriyê Durzî ku dîroka wan vedigere sedan salan, roleke girîng di bûyerên dîrokî de lîstine. Durzî di sala 1187’an de li kêleka Selahedîn li dijî xaçperestan beşdarî Şerê Hetînê bûn. Di sala 1260’î de li kêleka Memlûkiyan di Şerê Eyn Calutê de li dijî dagirkirina Mogolan şer kir. Di sedsala 19’an de, Durziyan bi pêşengiya Şêx Yehya El Hemdan li dijî operasyonên Mihemed Elî Paşa bi Osmaniyan re hevpeyman kir û li Cebel El Ereb ziyanên mezin gihandin artêşa Mihemed Elî Paşa. Lê ji bo hewldanên Osmaniyan ku kontrola xwe li ser çiya ferz bikin, alozî di navbera Durzî û Osmaniyan de derket. Di sala 1911’an de, Osmaniyan çend serokên Durziyan, wek Duqan El Etrash û Yahya Amer, bidarvekirin. Piştre jî Durziyan piştgirî da Şoreşa Mezin a Ereban a bi serkêşiya Şerîf Hisên, Şêx Sultan Paşa El Etreş ku ji kesên pêşîn bû ku ala şoreşê bilind kir. Di sala 1925’an de serkêşî ji Şoreşa Mezin a Sûriyê ya li dijî dagirkeriya Fransayê kir. Şêx Sultan Paşa El Etreş ku girêdana xwe ya bi yekîtiya Sûriyê ve nîaşn da, planên parçekirinê bi taybetî jî avakirina dewleteke serbixwe ya Durziyan, pêşniyarên Fransayê ku wî bikin rêveberê Çiyayê El Durzî red kirin. Di sala 1920’î de beşdarî Şerê Meyselûnê bû û di sala 1982’yan de wefat kir.

**Durzî bi yekbûna mutleq a Xwedê bawer in**

Ola Durzî ku wekî “Tewhîd” tê zanîn, di destpêka sedsala 11’an de an ku di dema Xîlafeta Fatimiyan de ji hêla Hemze Bîn Elî Bin Ehmed ve bi fermana Xelîfe El Hekîm Bîn Emrallah ve hate damezirandin. “Pirtûkçeyên Hikmetê” ku ji 111 nameyan pêk tê ku li ser 6 cildan hatine belavkirin, wek lêvegera sereke ya baweriya Durziyan tê naskirin. Durzî bi yekbûna mutleq a Xwedê bawer in û Pêxember Şuayb pîroz dikin. Li gorî vê baweriyê, piştî mirinê rih derbasî bedeneke din dibe.

Herwiha têkiliyeke rasterast a ola Durziyan bi ola Zerdeştiyê re heye ku yek ji kevntirîn olên yekxwedayî ye. Bi taybetî di warê yekxwedatiyê û dualîzma di navbera qencî û xerabiyê de Zerdeştiyê bandor li olên li paş xwe kiriye. Ola Durzî ji malzaroka mezheba Îsmaîlî ya Şîe derketiye holê, gelek bawerî bi pêş xistine ku meyla xwe didin yekxwedatiya felsefîk û ezoterîk. Bandorên vê yekê jî di felsefeya platonîk, gnostîk û zerdeştî (bi awayekî nerasterast) de diyar dibe. Pirtûkên wekî “Pirtûkçeyên Hikmetê” behsa sembolîzma ronahî û vejînê dikin.

**Li cîhanê nêzî 2,5 milyon Duriyên Miwehidîn hene**

Li cîhanê hejmara Durziyên Miwehidîn nêzî 2,5 milyon e û li van deveran belav dibin:

Sûriye: Siwêda, Ceremana û Sehnaya.

Lubnan: Şof, Metin û Kesrewan.

Filistîn û Îsraîl: Celîl, Kermel û Colan.

Urdun: El Ezreq û Selet.

**Di dîrokê de li dijî Durziyan zordestî û komkujî hatin kirin**

Di sala 1960’an de li Cebel Lubnanê ji ber fitneya mezhebî bi hezaran Durzî û Mesîhî hatin qetilkirin. Di sala 1925’an de an ku di dema Şoreşa Sûriyê de, gelek Durzî di şerê li hemberî Fransiyan de hatin qetilkirin. Piştî 2011’an, bi taybetî di sala 2018’an de di êrişên çeteyên DAIŞ’ê yên li ser gundên Siwêdayê de nêzî 200 Durzî bûn qurbanî.

**Durzî li Sûriyê rastî êriş û fitneyên mezhebî tên**

Durziyên li Siwêdayê ku bi helwesta xwe ya dijberî rejîma Beşar Esed dihatin naskirin, piştî hilweşîna rejîmê, rastî gelek êriş û fitneyên mezhebî yên tune hatin. Di vê dawiyê de jî ew fitne li Sehnaya û Cereman teqiyan û gihaştin gundewarê Siwêdayê. Ev êriş, di 28’ê Nîsanê de, bi belavbûna dengekî qeydkirî ku neheqiyê li olê dike zêde bûn. Durzî û xwendekarên li zanînehan rastî êrişên çekdarên desthilata Şamê hatin, bi wê re gelek ji wan hatin qetilkirin û birîndarkirin.

**Şêxên xwedî bandor di nava mezheba Durzî de**

Her sê şêxên aqilmend di nava mezhebê de xwedî bandorekî mezin in; Şêx Hikmet El Hicrî, Şêx Hemod El Henawî û Şêx Yûsif Cerboi.

**Komên xwecihî yên Durzî jî wiha ne:**

Tevgera Rîcal El Kerame ku di 2013’yan bi serkêşiya Şêx Wehîd El Belûs hat avakirin. Hejmara hêzê ne zelal e, lê ji komên mezin li Siwêdayê ye. Hêzên Şêx El Kerame di 2015’an de, piştî veqetîna endaman ji Rîcal El Kerame hat avakirin. Serkêşiya hêzê her du bira Fehed û Leys El Belûs dikin. Ehrar El Cebel jî bi serkêşiya Şêx Silêman Ebdulbaqî ye. Meclisa Leşkerî ya Siwêdayê jî ku çekdarên Durzî di 23’yê Sibata 2025’an de ragihandin, bi serkêşiya Tariq El Şofî ye.

**Mezheba Durzî hêvî ji bo siberojekê tê de pirrengî hebe dikin**

Mezheba Durzî, ya ku xwedî dîroka kevn û baweriya nimûne, îro rûbirûyî astengiyên çarenûsî de ye. Digel ku îsrara parastina taybetmendî û serxwebûna xwe dike, hêvî ji bo siberojekê tê de pirrengî hebe û rêzê ji mafên jiyan û rûmetê re di nava destûreke Sûrî ya demokratîk de bigire, heye.

# Şiyar Amed: Kongre ji bo banga Rêber Apo bû bersiva herî bi wate

**Ji delegeyên Kongreya Awarte ya 12’emîn a PKK’ê Şiyar Amed got, kongre ji bo banga aştiyê ya Rêber Apo bersiva herî bi wate ye û pêvajoyeke veguhertinê ya dîrokî destpê dike.**

Delege Şiyar Amed têkildarî Kongreya Awarte ya 12’emîn axivî û diyar kir kongre destpêkek nû ye. Amed got, “Kongre ji bo banga Rêber Apo ya aştî û civaka demokratîk bû bersiva herî bi wate.”

Şiyar Amed diyar kir ku ji bo avakirina sosyalîzma civaka demokratîk, destpêka pêvajoyeke nû ya têkoşînê îfade dike û got, “Ev pêvajoya ne tenê ji aliyê dîroka PKK’ê ve, ji bo gelê Kurd û hemû gelên Rojhilata Navîn tê wateya vebûna asoyeke nû.”



Nirxandina Şiyar Amed bi vî rengî ye:

Kongreya fesix û bidawîkirina têkoşîna çekdarî, ji banga Rêber Apo ya Aştî û Civaka Demokratîk re bû bersiva herî bi wate. Kongreyê destpêkê berxwedana Rêbertî silav kir, tam bi yekbûna nêrînan re ji banga Rêbertî re bersiv çêkir. Di heman demê de bi kelecan û coşeke mezin hate pêşwazîkirin. Di vê kongreyê de xwedî li hemû pêvajoyên ji kongreya ewilî heya niha, ji şehîdên ewilî heya niha hate derketin. Di vê kongreyê de ji Hakî Kareran heya heval Fuat û Riza, hevrêyên di berxwedana Zapê de şehîd bûne, hemû şehîdên me bi rêzdarî hatin bîranîn. Ked, hewldan û xebatên aştiyê yên ku ji aliyê Birêz Sirri Sureyya Onder ve hatine meşandin, di vê kongreyê de bersiva xwe dît. Bi vê yekê re her çendî ku ev kongre kongreya fesixkirin û bi dawîkirina têkoşîna çekdarî ya PKK’ê ye, di heman demê de destpêkek e. Hem dawiya demekê, hem jî destpêka demekê. Li ser vî bingehî li herêmê, li qada navneteweyî di xebatên enternasyonal de asoyek nû da çêkirin. Dema mirov ji aliyê kongreya destpêkê û kongreya niha ve lê dinêre, kongreya destpêkê tê wateya têkbirina fermana mirinê ya li ser Kurdan, Kongreya nû jî li ser bingehê azadiyê destpêkirina pêvajoyekê îfade dike. Lewma dawiya demekê, lê di heman demê de destpêka demeke nû îfade dike. Li ser vî bingehî ev pêvajo tê wê wateyê ku gelê Kurd, Tirk, gelên din ên li Tirkiyeyê, gelên Rojhilata Navîn bi hev re civaka aştîxwaz ava bikin.

Bi rastî jî em qala pêvajoyeke welê dikin ku wê bibe geşedanên pir mezin. Lewma hem wê Rojhilata Navîn hem jî siyaseta cîhanê bandor bike. Ev kongre hinceta hemû hêzên ku PKK’ê krîmînalîze dikin jê distîne, hêviyeke mezin belavî hemû cîhanê dike. Rêber Apo deriyên nû vekirin, em hêvî dikin ku hemû hêz vê yekê rast binirxînin û wate bidinê. Divê em jî bi berpirsyariyeke hîn mezintir û ciddiyet, nêzî pêvajoyê bibin. Divê em hîn zêdetir bixebitin. Ji bo avakirina sosyalîzma demokratîk û civakparêz, ji her demê bêhtir divê em bi civakê re bibin yek. Bi taybetî divê em zimanê Sirri Sureyya Onder ê demokratîk, diyalog û lihevkirinê esas bigirin û vê pêvajoyê ber bi pêş ve bibin. Di vê kongreyê de ruh û zimanê wî serwer bû. Kongreyê berpirsyariya xwe bi cih aniye. Ev dem, dema avakirina azadiyê ye. Sîstema ku li ser înkarkirina Kurdan hatî avakirin, derbe xwar. Lewma em dikarin qala serketina îdeolojîk a Rêber Apo bikin. Eger mirov li ser vî bingehî nêzî kongreyê bibe wê bi wate be. **ANF**